Bundesamt
für Migration
und Flüchtlinge

# Agahdarî li ser piştevaniya ji bo zimanê elmanî yê têkildarî kar li gorî maddeya 45a ya Qanûna Niştecîhbûnê

Armanca kursên zimanê kar ew e ku kesek bilez û mayînde bikaribe tevlî xwendina pîşeyî (meslek) û kar û xebatê bibe.

Hûn dikarin bi van mercên li jêrê beşdarî kursa zimanê kar bibin:

- eger hûn wek welatiyekî biyanî li Elmanyayê bijîn
- an jî hûn hemwelatiyê welatekî Yekîtiya Ewropayê (YE) bin
- an jî hûn hemwelatiyê Elmanyayê bin, lê elmaniya we têr nekê ku hûn tevlî xwendina pîşeyî (meslek) û kar û xebatê bibin.

## 1. Kursên zimanê kar çi ne?

Di kursên fêrkirina zimanê kar de, zimanê elmanî yê têkildarî kar tê hînkirin. Dewreyên fêrkirina zimanê ji bo kar di çarçova kursên fêrkirina zimanê kar yên seretayî û kursên fêrkirina zimanê kar yên taybet de tên lidarxistin.

### Kursên fêrkirina zimanê kar yên seretayî û yên taybet

Ev dewre anku kurs ji 400 heta 500 civînên fêrkirinê pêk tên, ku her civînek bi qasî 45 deqîqeyî didome. Ev dewreyên fêrkirinê dikarin di astên zimanî yên A2, B1, C1 an jî C2 de bin. Kursên fêrkirina zimanê kar herî pirr bala xwe didin nasyarkirina digel zimanê elmanî yê têkildarî kar di asteke diyarkirî de. Di van dewreyan de hûn fêrî zimanê elmanî yê têkildarî kar dibin. Ji billî rêziman, hûn bi taybet peyvên ku di kar de pêwîstiya we pê heye hîn dibin, da ku bikaribin digel hevkar û berpirsê xwe pêwendiyê çêbikin û digel mişteriyan bikevin têkiliyê.

### Dewreyên taybet yên fêrkirina ziman: Dersên taybet / pêvajoya qebûlkirinê

Di van kursên taybet de zimanê elmanî yê têkildarî kar û pîşeyên taybet an jî beşên kar yên taybet tê fêrkirin. Di van kursên taybet de hûn bêjeyên taybet û rêzimana taybet, ku ji bo kar û pîşeyê wê yê taybet pêwîst in, fêr dibin. Giraniya van kursan li ser pisporiya girêdayî karekî û zimanê wî karî ye, ji bo ku hûn bikaribin di wî kar û pîşeyê taybet de kar bikin.

## 2. Destûra beşdariya di dewreyên kursa zimanê kar de

### Destûra beşdariya di dewreyan de ji aliyê Ajansên Kar (Agenturen für Arbeit) an jî Navendên Peydakirina Kar (Jobcenter) ve

Hûn dikarin destûra beşdariya di kursa zimanê kar de werbigirîn, bi mercê ku

- hûn wek kesekî ku li perwerdeya pîşeyî digerin qeydkirî bin, an jî
- wek kesekî ku li kar digerin qeydkirî bin, an jî
- wek kesekî bêkar qeydkirî bin, an jî
- beşdarvanê dewreyeke perwerdeya kar ya Ajansa Kar (Agentur für Arbeit) bin, an jî
- hûn wergirê alîkariyên aborî yên dewletê li gor maddeya SGB II bin

Mafê beşdariya di dewreyeka fêrkirina zimanê kar de hûn ji aliyê Ajansa Kar a ji bo we berpirsyar, an jî Navenda Peydakirina Kar werdigirin.

Heke hûn li cem Ajansa Kar (Agentur für Arbeit) qeydkirî bin, ev yek bi rengê destûrdanê pêk tê.

Heke hûn li cem Navendeke Peydakirina Kar (Jobcenter) qeydkirî bin, dîsa ev yek bi rêya destûrdanê pêk tê, heke we ligel karmenda xwe ya întegrasyonê peymaneke hevkariyê (elmanî: Kooperationsplan) di navbera xwe de girêdabe. Heke peymaneke wiha ya hevkariyê nebatibe girêdan, wê li we bê ferzkirin ku hûn tevlî kurseke zimanê kar bibin.

Ligel vê destûrdan/ferzkirinê, lîsteyeke derbarê dewreyên kursa zimanê kar de, yên ku li nêzikî cihê jiyana we û di demên nêzîk de destpêdikin, radestî we tê kirin (ku jê re “Prînta KURSNET” tê gotin). Hûn dikarin xwe li cem yek ji Saziyên Rêvebirina Kursan (Kursträger) yê li gorî daxwaza xwe tomar bikin.

## Destûra beşdariya kursa ziman ji aliyê Rêveberiya Federal a Koçberî û Penaberan ve

Hûn dikarin daxwaza destûra beşdariya kursê ji Rêveberiya Federal a Koçberî û Penaberan (BAMF) bikin, bi şertê ku hûn ne weke kesekî ku li perwerdeya pîşeyî digere, li kar digere, an jî weke kesekî bêkar qeydkirî bin û herwiha ne wergirê alikariya aborî ya dewletê li gor maddeya SGB II bin û

- bi kar bin, an jî
- di pêvajoya qebûlkirina bawernameya we ya pîşeyî ya ji welatekî derveyî Elmanyayê bin, an jî ji bo serlêdana dayîna destûra karkirinê, pêwîstiya we bi asteke diyarkirî ya ziman hebe, an jî
- di xwendina pîşeyî (meslek) de bin, an jî
- hûn bixwazin xwe ji bo xwendina pîşeyî (meslek) amade bikin.

Hûn destûreke nivîskî ya beşdariya di dewreyê de werdigirin. Hevdem hûn lîsteyeke Saziyên Rêvebirina Kursan (Kursträger) jî, ku nêzikî cihê jiyana we ne û di demên nêzîk de dewreyên fêrkirina zimanê elmanî ji bo kar (Prînta "KURSNET") lidardixin, werdigirin. Bi vê belgeya destûrê ya nivîskî hûn dikarin xwe li ba yek ji Saziyên Rêvebirina Kursan, yê li gorî daxwaza xwe, qeyd bikin.

## Heyama mafê we yê destûra tevlîbûnê

Destûra beşdarbûna we di dewreyeke fêrkirina zimanê ji bo kar de bi qasî sê mehan derbasdar e. Hûn dikarin tenê di heyama vê moleta diyarkirî de li ba yek ji Saziyên Rêvebirina Kursan ji bo dewreya fêrkirina zimanê kar navê xwe tomar bikin. Ji ber vê yekê, ji kerema xwe, di dema herî bilez a mumkin de navê xwe tomar bikin, anku pêvajoya navnivîsînê derbas bikin û orîjînala destûra xwe ya beşdariya di dewreyê de radestî Saziya Rêvebirina Kursan bikin. Eger li ser we bê ferzkirin ku hûn beşdar bibin, çêdibe ku moleta ji bo we, heta ku divê hûn navê

xwe tomar bikin, kurtir be. Heyama demî ku divê hûn li ba yek ji Saziyên Rêvebirina Kursan navê xwe tomar bikin, di nameya ferza beşdarîkirina di kursê de hatiye nivîsandin. Tenê eger hûn ji derveyî Elmanyayê serlêdana tevlîbûna kursê bikin, destûra têvlîbûnê ku bo we tê dayîn ji bo neh mehan derbasdar e.

## 3. Li hêla Saziya Rêvebirina Kursan

Saziya Rêvebirina Kursan divê dem û roja destpêbûna çaverêkirî ya dewreyeke fêrkirina zimanê kar ji we re diyar bike. Dewreya fêrkirina zimanê kar nabe ku derengtir ji çar hefteyan piştî tomarkirina navê we dest pê bibe. Eger di vê heyamê de dewreya fêrkirina zimanê kar neyê lidarxistin, hûn bo cihêkî din yê dewreyên fêrkirinê tên şandin. Di vê rewşê de Saziya Rêvebirina Kursan divê orîjînala destûra beşdariya di dewreyên zimanê kar de dîsa li we vegerîne. Ev destûra beşdariya di dewreyê de divê hûn radestî Saziya Rêvebirina Kursan ya nû bikin.

Ji kerema xwe hertim misoger bikin ku Saziya Rêvebirina Kursan û Daîreya Federal ya Koçberî û Penaberan bikaribin digel we bikevin têkiliyê. Eger we mala xwe guhert, ji kerema xwe bilez Saziya Rêvebirina Kursan ji vê yekê haydar bikin.

## 4. Beşdariya birêkûpêk di dewreya kursê de

Ji bo gihiştina armanca dewreya fêrkirina zimanê kar, hûn divê li gorî qanûn û rêzikan beşdarî dersan bibin. Ev tê wê wateyê ku hûn bi awayekî rêkûpêk di dersan de amade bibin û beşdarî ezmûna raberkirina bawernameyê bibin. Ders û ezmûn ne asan in.Heke hûn gellek caran tevlî dersan nebin, armanca kursê bi dest nakeve. Wê demê careke din tevlîbûna kursê ne mumkin e. Guhertina Saziya Rêvebirina Kursan beriya bidawîhatina kursê bi ti awayî ne mumkin e. Saziya Rêvebirina Kursan divê dem û rojên amadenebûnê ji Ajansa Kar (Agentur für Arbeit), an jî Navenda Peydekirina Kar re ragihîne. Eger hûn nexweş ketin, divê hûn ji roja duyem a amadenebûnê de belgeyeke bijîşkî raber bikin.

## 5. Mesrefên kursê

Beşdariya di dewreyeke fêrkirina zimanê kar (Berufssprachkurse) de bi giştî bêpere ye.

Eger karê we hebê û dahata we ya salane zêdetirî 20.000 EUR (bi tenê) an 40.000 EUR (zewicî) be, divê hûn beşekî mesrefê, ango bi qasî ji sedî 50ê mesrefên bo her seeteke dersê, bi xwe bidin Saziya Rêvebirina Kursê (Kursträger). Beşê mesrefên li ser we yên derbasdar hûn dikarin di pêveka hejmar 3 yên rêzikên hesabkirinê yên DeuFöV li ser malpera Daîreya Federal ya Koçberî û Penaberan bibînin. Ev pişkê ji mesrefê divê beriya destpêbûna dewreyeke kursa zimanê kar were dayîn. Eger hûn di dersan de amade nebin, pereyê mesrefa dersên ji dest çûyî li we nayê vegerandin.

Eger karê we hebê, lê hûn ne mecbûr bûn ku di destpêka kursê de pişkekî ji mesrefên kursê bidin, lê dewreya fêrkirinê nîvco bihêlin û kursê biterkînin, wê demê hûn mecbûr dibin ku tevaya

mesrefa kursê bi xwe bidin. Tenê di rewşekê de ku sebeba nîvcohiştina kursê ne di we de be, kurs ji bo we bêpere dimîne!

## 6. Lêvegerandina pişk û mesrefê

Eger di heyama du salan piştî dayîna destûra beşdariya di dewreyê de, hûn pejirîn û serketî derbaskirina ezmûna dayîna bawernameyê biselimînin, Rêveberiya Federal a Koçberî û Penaberan li ser serlêdana we ji sedî 50 ji pişkê mesrefa ku we daye, li we vedigerîne.

## 7. Mesrefa hatûçûnê

Eger pêwîst bike, li ser serlêdana we, parek ji mesrefên hatûçûna we li we tê vegerandin, bi mercê ku eger hûn

- Meaşê Bêkariyê 1 (SGB III)
- Meaşê Hemwelatiyan (SGB II)
- Alîkariya Dewletê (SGB XII)
- Alîkariya Ciwanan (SGB VIII, li şûna meaşên li gorî Yasaya Alîkariyên ji bo Penaxwazan)
- Wergirtinên li gorî Yasaya Alîkariyên ji bo Penaxwazan (AsylbLG)
- Alîkariya Fêrbûna Pîşe li gorî Yasaya 56 ji Pirtûka SGB III

werdigirin.

Ev jî bi mercê ku cihê kursê herî kêm sê kîlometreyan dûrî mala we (kurttirîn rêya peyaçûnê) be.

Piştî jêhaydarbûna we ku kengî dewreya kursa zimanê kar destpêdike, hûn dikarin bi rêya Saziya Rêvebirina Kursê (Kursträger) ji Rêveberiya Federal a Koçberî û Penaberan daxwaza alîkariya aborî ji bo mesrefa hatûçûnê bikin.

## 8. Çavdêriya zarokan

Eger di rêkxistina çavdêriya zarokan de pêwîstiya we bi alîkariyê hebe, ji kerema xwe serî li Saziya Rêvebirina Kursê (Kursträger) bidin.

## 9. Beşdarîya di ezmûnan de

Hemû kursên fêrkirina zimanê kar, ji bilî kursên fêrkirina zimanê kar yên bi dersên taybet, bi ezmûneke bi dawî dibin. Eger hûn di ezmûnê de bi ser nekevin, mecal heye ku hûn ezmûnê carekê dubare bikin. Beşdarbûna di ezmûnê de (her wiha carekê dubarekirina wê jî) bêpere ye.

## 10. Dubarekirina dewreya fêrkirina zimanê kar

Eger we nekarîbû di ezmûnê de bi têrî fêrbûna zimanê elmanî biselimînin û neyê çaverêkirin ku hûn bêyî dubarekirina dewreya kursê bikaribin ezmûnê serketî derbas bikin, wê demê hûn dikarin dewreye fêrkirina zimanê kar careke din dubare bikin. Ji bo dubarekirina yek-carî ya dewreya fêrkirina zimanê kar divê hûn serlêdanê ji bo destûreke nû ya beşdariya di dewreyê de li cem Ajansa Kar (Agentur für Arbeit) / li cem Navenda Peydakirina Kar (Jobcenter) / li cem Rêveberiya Federal a Koçberî û Penaberan bikin. Wê demê hûnê destûreke nû ya tevlîbûnê wergirin.

## 11. Tişta ku hûn ji bilî vêya divê bizanibin

Hemî formên serlêdanê yên di vê belgeyê de behsa wan hatî kirin, hûn dikarin ji Saziya Rêvebirina Kursê (Kursträger), ji Ajansa Kar, Navenda Peydakirina Kar, an jî ji malpera www.bamf.de werbigirin. Ji bo hûrgiliyên zêdetir daxwaza alîkariyê ji Saziya Rêvebirina Kursê (Kursträger) bikin.